

## Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn

15-31 Cotmehê, 2022

### 17ê Cotmehê, 2022

**Ji ber çar axaftinên wê, 11 sal û 7 meh cezayê girtîgehê li Hevseroka KCDê Leyla Guvenê hat birîn.**

Li parlamentera berê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Leyla Guvenê, bi hinceta ku di çar axaftinên cuda de "propagandaya PKKê kiriye" 11 sal, 7 meh û 15 roj cezayê girtîgehê hat birîn.

Di dozeke din a ku li 2yemîn Dadgeha Cezayên Giran a Diyarbekirê de jî ji ber sûcê "endamtiya rêxistina terorê ya çekdar" 6 sal û 3 meh cezayê girtîgehê li Leyla Guvenê hatibû birîn û biryar ji aliyê 16emîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Cezayê Giran ve hat erêkirin. Di encama wî cezayî de parlementeriya Guvenê hatibû betalkirin.

Li Amedê bi hinceta "endamtiya rêxistina terorê ya çekdar" û "propagandaya rêxistinê" di 21ê Berfanbara 2020an de 22 sal û 3 meh cezayê girtîgehê li Guvenê hatibû birîn. Guven di encamê de hatibû girtin.

**Rêveberên berê yên Baroya Amedê ji daxuyaniya der barê qirkirinê de beraat kirin**

**(Doza Cihan Aydın û yên din)**

Di rûniştina ewil a doza ku Serokê Baroya Amedê yê serdema 2018-2020an Cihan Aydın û 10 endamên lijneyê dihatin darizandin de biryar hat dayîn. Di encama doza ku li 11emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê pêk hat de serokê berê yê baroyê Cihan Aydın û endamên lijneya rêveberiyê yên berê Muhlis Ogurgul, Ahmet Dag, Erhan Aytekin, Fırat Uger, Gazal Bayram Koluman, Mehmet Akbaş, Serdar Çelebi, Tevfik Karahan, Omer Şeran û Ozgur Yılmaz Biçen berat kirin.

Doz ji ber du daxuyaniyên der barê Qirkirina Ermeniyana de hatibû vekirin ku di 24ê Nîsana 2019an de li ser malpera baroyê hatibûn weşandin. Rêveberên baroyê bi daxwaza cezayê hepsê ya 2 salan, bi hinceta ku "Neteweya Tirk, Dewleta Komara Tirkîyeyê û sazî û organên dewletê biçûk xistine" û li gorî 301emîn xala Qanûna Cezayê ya Tirkîyeyê dihatin darizandin,

### 18ê Cotmehê, 2022

**1emîn Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê biryara betalkirina konsera Îlkay Akkaya da sekinandin**

1emîn Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê înfaza biryara betalkirina konsera muzîkjen Îlkay Akkayayê da sekinandin. Konsera ku ji aliyê Walfîtiyê ve bi hinceta ewlehiyê hat betalkirin, wê di 17ê Cotmehê de li Navenda Çandê ya Ataturkê ya Şaredariya Yenîşehîrê bihata lidarxistin. Îlkay Akkaya got, "Em hêvî dikin ku ev biryar ji bo dozên din jî bibe mînak. Em ê konsera xwe ya Mêrsînê di zûtirîn demê de li dar bixin."

Berê jî konserên Akkaya yên ku dê li Edene, Riha û Mêrsînê li dar biketina hatibûn betalkirin.

### **Ji ber nivîsa wî, 15 hezar cezayê pereyê li rojnameger Yusuf Karadaş hat birîn**

Ji ber qunciknivîsa Yusuf Karadaş a bi sernavê "rêxistina tarî ya îqtîdarê, SADAT" 15 hezar lîre cezayê tazmînatê li Rojnameya Evrenselê hat birîn. Doza ku bi îdiaya "êrîşa li dijî mafên şexsî" hat vekirin dê sewqî dadgeha îstîfafê bê kirin.

Yusuf Karadaş di 19ê Cotmeha 2021an de di rojnameya Evrenselê de di qunciknivîsa xwe ya bi sernavê "rêxistina tarî ya îqtîdarê, SADAT" de, Şirketa Şewirmendiya Parastina Navneteweyî, Pîşesaziya Înşaatê û Bazirganiyê (SADAT) rexne kir. Karadaşê ku di gotara xwe de îdiayên derbarê SADATê de anîn ziman, di heman demê de cih da gotinên damezrînerê SADATê Tugeneral Adnan Tanriverdi jî. Di nav van îdiayên ku di çapemeniyê jî cih girtine de ev hene: SADAT di şerê Sûriye û Lîbyayê de cih girtiye, bi çekên 'wendabûyî' yên piştî hewldana derbeya 15ê Tîrmehê re têkildar e, kampên perwerdeyê vekirine. SADATê bi îdiaya "êrîşa li dijî mafên şexsî" der barê Karadaş de doz vekir.

(Bo xwendina nivîsê: [İktidarın karanlık örgütü SADAT](#))

### **18ê Cotmehê, 2022**

#### **Doza Daxuyaniya Çapemeniyê ya Odeya Tabîban a Wan û Colemêrgê**

Nûnera Wanê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyeyê (TÎHV) Sevim Çiçek û bijîşk Dr. Huseyin Yaviç ji ber xwestin ku Bijîşk Rûmeysa Berin Şen a ku li Enqereyê di veqera ji nobetê, di qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest da bi bir bînin, tîn darizandin. Piştî mirina Rumeysa Berin Şen, Yekîtiya Tabîbên Tirk (TTB) ji bo şert û mercên giran ên xebatkarên tenduristiyê bînin rojevê, di 25ê Cotmeha 2021an de li tevahiya welêt daxuyaniyên çapemeniyê pêk anîn. Lê belê, daxuyaniya çapemeniyê ya li Wanê ji aliyê polîsan ve hat astengkirin. Walîtiya Wanê ji 21ê Mijdara 2016an heta 27ê Hezîrana 2022an hemî çalakî xwepêşandan qedexa kirine. Dr. Huseyin Yaviç û Sevim Çiçek bi hinceta ku Qanûna Civîn û Xwepêşandanan a bi hejmara 2911an bînpê kirine, hatin binçavkirin û der barê wan de doz hat vekirin. Danişîna duyemîn a dozê di 18ê Cotmeha 2022an de li 4emîn Dadgeha Cezayên Asliyeyê ya Wanê pê hat. Rûniştina bê, dê di 26ê Çileyê 2023an de bê dîtin.

### **19ê Cotmehê, 2022**

#### **RTUKê sê roj cezayê reşkirina ekranê li Tele1ê birî**

Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) bi hinceta ku "di weşanên xwe de cudakariya ziman, ol û nijadî dîke" 3 roj cezayê "reşkirina ekranê" li Tele1ê birî. Wekî sedema biryarê, gotinên Endama Partiya Karkeran a Tirkîyeyê (TIP) Sera Kadigil a ku beşdarî weşana Tele1ê bû hat nişandan. Kadigilê wiha gotibû: "Diyaret bi şeklê xwe yê îroyîn amûreke îslamî ya siyasî ye".

Endamê Lijneya Bilind a RTUKê İlhan Taşçı nûçe wiha ragihand: "RTUKê di nav salekê de du caran bi hinceta ku cudakariya ziman, ol û nijadî kiriye, biryar da ku ekrana Tele1ê ji bo 3 rojan bê girtin. RTUKê biryara xwe spart xala 8/1/b ya zagona bi hejmara 6112an (Zagona der heq Sazkirin û Weşana Radyo û Televîzyonan). Biryar bi piraniya dangan hat dayîn. Pêngava din bidawîkirina jiyana weşanê ya kanalê ye! Ya ku tê qetilkirin demokrasî ye. Ger ku heta Sibata 2023an cezayek bi vî rengî werbigire, kanal wê lîsansa weşana xwe winda bike."

Rêveberiya Tele1ê ji bo betalkirin û rawestandina înfaza cezayê, bi hinceta ku ev biryara neheq û nehiqûqî ye serî li dozgeriyê da. Dadgeha Îdarî ya 2yemîn a Enqereyê di 26ê Cotmeha 2022an de bi yekdengî biryara rawestandina înfazê da.

### **Tirkiyeyê di azadiya internetê de du xalên din winda kirin**

Di rapora Freedom Housê ya der barê azadiya internetê de Tirkiyeyê, bi 32 puanan, di nav welatên neazad de cih girt. Tirkiye par jî bi 34 puanan di nav heman kategoriyê de cih girtibû. Îsal du puanên din ji xwe kêmkir. Rapor, di navbera Hezîrana 2021an û Gulana 2022an de li 70 welatan, li azadiya internetê hûr dibe.

Di raporê de hat ragihandin ku li Tirkiyeyê bihayê internetê bilind e û di van salên dawîn de sînorkirinên naverokê zêdetir bûye.

Ev rapor %89ê bikarhênerên internetê yê cihanê dihewîne. Azadiya internetê li ser pîvaneke 100 puanî, li ser bingeha 21 nîşaneyên cihêreng ên wekî astengên gihastinê, sînorkirinên naverokê û mafên bikarhêneran tê nixandîn.

### **Doza Fatin Kanat (Serokê Komeleya Mafên Mirovan ê Enqereyê)**

3yemîn danîşîna doza Hevserokê Şaxa ÎHDê ya Enqereyê Fatîna Kanat di 19ê meha Cotmehê ya 2022an de pêk hat. Dozger xwest ku Kanat bê cezakirin. Doza Kanat, bi îdiaya "propagandaya rêxistina terorê kiriye" li 25emîn Dadgeha Cezayên Giran a Enqereyê tê dîtin.

Di dozê de 9 daxuyaniyên çapemeniyê yê di sala 2019an de ji aliyê "Înîsiyatîfa ji Girtiyên Nexweş re Azadî" ku li ber avahiya Şaxa ÎHDê ya Enqereyê hat dayîn û daxuyaniya çapemeniyê ya ku di sala 2018an de ji aliyê "Înîsiyatîfa Ji Roboskî re Edalet" ku li ber avahiya Şaxa ÎHDê ya Enqereyê hat dayîn, wekî delîl hatin nîşandan.

Di lêpîrsîna der barê Kanat de ji ber sûcê "endamtiya rêxistina terorê ya çekdar" biryara neşopandinê hat dayîn, lê dozger îdia kir ku daxuyaniyên çapemeniyê yê navborî "bi fermana rêxistinê" hatine dayîn.

Doz wê di 8ê Kanûna 2022an de li 25emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê dewam bike.

## 20ê Cotmehê, 2022

### **Bi hinceta ku heqaret li Erdogan û Bahçelî kiriye li rojnameger Mehmet Emîn Kurnaz cezayê girtîgehê hat birîn**

Edîtorê Rojnameya BîrGûnê Mehmet Emîn Kurnaz li 2yemîn Dadgeha Cezayên Asliyeyê ya Stenbolê bi îdiaya ku heqaret li Serokomar Recep Tayyîp Erdogan û Serokê MHPê Devlet Bahçelî kiriye dihat darizandin. Di dozê de biryar hat dayîn. Dadgehê ji bo her du bersûcan cihê cihê 11 meh û 20 roj cezayê girtîgehê birî û eşkerekirina biryarê bi paş xist.

Mehmet Emîn Kurnaz ji ber nivîsa xwe ya bi sernavê "İqtîdara Çeteyan" ku di 25ê Gulana 2021an de weşiyabû, bi îdiayên "heqaret li memûrekî giştî kiriye" û "heqaret li serokomar kiriye" hat darizandin. Kurnaz di gotara xwe de behsa îdiayên sêgoşeya mafya-dewlet û siyasetê kir ku bi eşkerekirina Sedat Peker dîsa ketibû rojevê.

## 21ê Cotmehê, 2022

### **Doza Fatma Yıldızhanê**

24 parêzvanên mafên jinan di 16ê Adara 2022an de bi hinceta endamtiya rêxistina terorê hatin binçavkirin. 11 kes ji wan hatin girtin û yê mayî hatin berdan. Wekî sedema binçavkirinê ev xal hatin nişandan: daxuyaniyên bi boneya Roja Aştiyê ya Cîhanê, vekişîna Tirkîyeyê ya ji Peymana Stenbolê û Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê, her wiha civîn, çalakî û daxuyaniyên çapemeniyê yên li Amedê pêk hatine.

Ji kesên binçavkirî Fatma Yıldızhan heta 19ê Adarê di binçav de ma û piştê hat girtin. Heta rûniştina yekemîn a di 8ê Hezîrana 2022an de, di girtîgehê de ma. Bi şertê kontrola edlî û qedexeya derketina derve hat berdan. Di danîşîna ku di 21ê Cotmeha 2022an de hat dîtin de biryar hat dayîn ku doz bê rawestandî.

## 24ê Cotmehê, 2022

### **Der barê parêzera ku gotibû 'Divê îdiayên çekên kîmyewî bên lêkolînkirin' lêpîrsîn hat destpêkirin.**

Di Civîna Giştî ya Asayî ya Baroya Îzmîrê ya 2022-2024an de ku di 22ê Cotmehê de pêk hat, parêzer Aryen Turan a endama Komeleya Hiqûqnasên Ji bo Azadiyê (ÖHD) xwest îdiayên çekên kîmyewî bên lêkolînkirin. Turan her wiha bi dirûşma "Jin, Jîyan, Azadî" Mahsa Amînî bibîr anî ku li Îranê bi hinceta rêgezên hicabê bînpê kiriye, hat binçavkirin û qetînkirin.

Serdozgeriya Komarê ya Îzmîrê ji ber axaftina Aryen Turanê û hin sloganên li salonê hatin gotin lêpîrsîn da destpê kirin.

## 26ê Cotmehê, 2022

### **Bi hinceta ku li dijî Qanûna Civîn û Xwepêşandan derketiye doz li Eren Keskin hat vekirin.**

Der barê Eren Keskin û hin parêzerên din ku di 20ê Tebaxa 2019an de ji bo şermezarkirina jikardexistina şaredar û endamên meclîsê yên şaredariyên Amed, Mêrdîn û Wanê daxuyanî dabûn doz hatibû vekirin. Doz bi hinceta ku parêzeran Qanûna Civîn û Xwepêşandanê ya bi hejmar 2911an bin pê kirine vebû. Di danişîna ku di 26ê cotmehê de pêk hat de, biryar nehat standin. Rûniştina bê dê 13ê Sibata 2023an pêk were.

## 27ê Cotmehê, 2022

### **Seroka TTByê Şebnem Korur Fincancı hat girtin**

Seroka Yekitiya Tabîbên Tirk (TTB), pispora tîba edlî Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancı di 25ê Cotmeha 2022an de bi serdegirtina mala wê ya li Stenbolê, bi hinceta ku "propagandaya rêxistina terorê kiriye" hatibû binçavkirin. Piştê ew birin Enqereyê.

Şebnem Korur Fincancı piştî ku îfadeya xwe da, sewqî Edliyeya Enqereyê hat kirin. Îfadedayîna wê 4 saet ajot û piştê bi daxwaza girtinê sewqî Dadgeha Cezayên Sulhê hat kirin. Heyeta dadgehê piştî navbereke 15 deqîqeyî bi îdiaya ku "propagandaya rêxistina terorê kiriye" biryara girtinê da. Şebnem Korur Fincancı birin Girtîgeha Girtî ya Jinan a Sîncanê.

Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê di 20ê Cotmeha 2022an da der barê Fincancı de bi hinceta ku "propagandaya rêxistina terorê kiriye" û "Heqaret li milletê tirk, dewleta Komara Tirkiyeyê, sazî û organên dewletê kiriye" lêpîrsîn dabû destpêkirin.

Hat îdiakirin ku di operasyona ku Hêzên Çekdar ên Tirkiyeyê bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re li Bakurê Iraqê pêk anîn de çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Di encamê de bi van çekan 17 endamên HPGê hatin kuştin. Dîmenên ku tê îdiakirin têkildarî vê bûyerê ye di medyaya civakî de hatin belavkirin.

Ji aliyê kanaleke Youtubê ya ku ji derveyî welat weşanê dike û tê îdiakirin ku nêzî PKKê ye, der barê van dîmenan de pirs li Fincancı hatin kirin. Pispora tîba edlî Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancı wekî bersiv ev gotin: "Min berê jî lêkolîn kiribû. Diyar e, yek ji gazên jehrîn ku rasterast bandorê li sazûmana siniran dike, hatiye bikar anîn. Gelek cureyên çekên kîmyewî hene. Her çendî bikaranîna wê qedexa be jî, mixabin em dibînin ku di pevçûnan de tînan bikaranîn."

### **Ji ber nûçeyê ku kiriye, du sal cezayê girtîgehê li rojnameger Ismail Ari birîn.**

Der barê Rojnameger Ismail Ari de ji ber nûçeyê wî doz hatibû vekirin. Sernavê nûçeyê ev bû: "Rojnameya BirGünê gihast belgên der barê cezayên pereyî yên li Serok û Midûrê Giştî yê Heyva Sor hatibû birîn" Nûçe di 6ê Cotmeha 2020an de di Rojnameya BirGünê de hatibû weşandin. Di encamê biryar hat dayîn û du sal cezayê girtîgehê li Ismail Ari birîn.

Nûçe li ser li du rêveberên Heyva Sor bû. Her du rêveber di salên dawî de bi îsraf û skandalên gendeliyê ketibûn rojevêjê. Ji aliyê Serokatiya Lijneya Teftîşê ya Midûriyeta Giştî ya Têkiliyên Civaka Sivîl a bi ser Wezareta Karên Hundir ve cezayên pereyî li rêveberan hat birîn.

Arî bi îdiaya ku "daneyên şexsî bi awayekî der hiqûqî desteser û belav kiriye" dihat darizandin. Rûniştina dawî ya dozê li 58emîn Dadgeha Cezayên Asliyeyê ya Çaglayanê hat dîtin. Dadgehê li gorî TCK 136/1ê 2 sal cezayê girtîgehê birî. Dadger biryara taloqkirina eşkerekirina biryarê da.

(Ji bo xwendina nûçeyê: [birqun.net](http://birqun.net))

### **Hevseroka berê ya HDPê Aysel Tuğluk hat berdan**

Rapora Saziya Tiba Edlî (ATK) ya der barê Parlamentera berê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Aysel Tuğluk gihaşt rêveberiya girtîgehê. Di raporê de hatibû gotin ku "nikare di girtîgehê de bimîne". Piştî ku Dadgerê Înfazê jî bi heman awayî fikra xwe ragihand, Tuğluk hat berdan.

Aysel Tuğluk di sala 2005an de hevseroka damezrîner a Partiya Civaka Demokratîk bû. Du serdeman parlementerî kir, ji ber rêzîknameya partiyê cara sêyem nebû namzet. Di 2yemîn Kongreya Asayî ya 24ê Çileyê 2016an de ji bo Meclîsa Partiyê ya HDPê hat hilbijartin û wekî cîgirserok hat tayînkirin. Dema ku di vê wezîfeyê de bû di çarçoveya lêpîrsîna Serdozgeriya Komarê ya Amedê de di 26ê Kanûna 2016an de hatibû binçavkirin û piştî 3 rojan bi îdiaya ku "Rêveberê rêxistina terorê ya çekdar e" hatibû girtin.

Tevî ku di Sibata 2021an de teşîsa nexweşiya "demansê" lê hatibû danîn jî, ATKê 3 caran bersiva neyînî da daxwaza Aysel Tuğluk a ji bo tehlîyeyê.

### **Doza Eren Keskin a der barê medyaya civakî de**

Di mehên Çile û Îlona 2015an de der barê 19 kesan ku di nav wan de Eren Keskin jî heye, bi hinceta ku bi rêya medyaya civakî propagandaya rêxistina terorê dikin (TMK 7/2) û dijberiya qanûna çapemenî û xwepêşandanan dikin (2911) doz hatibû vekirin. Di 12ê Cotmeha 2015an de ji ber ku li ber Edliyeyê daxuyaniya çapemeniyê dan, li endamên Komeleya Hiqûqnasên Ji bo Azadiyê û Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD) doz hatibû vekirin. Her du doz kirin yek. Rûniştina bê dê di 24ê Çileyê 2023an de saet di 10:00 de li 13emîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê bê dîtin.

### **28ê Cotmehê, 2022**

#### **Jina ducanî negirtin ji bo kar û ev yek wekî cihêkarî hat hesabandin**

Jineke ducanî serî li karekî da û ji ber ku ducanî bû ew negirtin ji bo kar. Li ser vê yekê jinê, serî li Saziya Mafên Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkiyeyê (TÎHEK) da. Saziyê biryar da ku ji aliyê zayendperezîyê ve cudakarî li jinê hatiye kirin. Di biryara ku xala 41emîn a makezagonê bi bîr dixist de hiqum hat dayîn ku 10 hezar lîre cezayê îdarî li xwediyê kar bê birîn.



Serîlêder wekî fizyoterapîst ji hêla nexweşxaneyekê ve hatibû qebûl kirin. Ji bo bikaribe dest bi kar bike diviya çend belge amade bikira. Di wê pêvajoyê de jin hîn bû ku ducanî ye û agahî da nexweşxaneyê. Çend roj şûn ve yekîneya çavkaniyên mirovî ya nexweşxaneyê ragihand ku ji ber ku di dema destûra dayikiyê de û şîrdayînê de dê hewcedarî pê hebe ku li şûna wê personelek bê îstihdamkirin dê nikaribin wê bigrin bo kar.

### **Konsera Îlkay Akkaya bi hinceta "refaha gel" hat astengkirin.**

Konsera ku hunermend Îlkay Akkaya dê di 31ê cotmehê de li ser sehneya Yekîtiya Odeyên Akademîk ên Bûrsayê bida, ji aliyê Qeymeqamê Nîlufere ve bi hinceta "refaha gel" hat astengkirin. Konserên Akkaya yê berê yê li Şanlıurfa, Mêrdîn, Edene û Mêrsînê jî bi hincetên bi heman rengî hatibûn betalkirin.

### **Di çalakiya ji bo berdana girtiyên nexweş de 3 kes hatin binçavkirin ku yek ji wan rojnameger e.**

Di hefteya 32emîn a çalakiya Nobeda Edaletê ku ji bo girtiyên nexweş bêt berdana li ber Edliyeya Stenbolê tê lidarxistin de du xizmên girtiyan xwest bimeşin. Polîsên ku mudaxeleya xwişka Selim Çiftçi ya bi navê Cemile Çiftçi û dayika Yakup Akman a bi navê Fincê Akman kir tevî rojnameger Zeynep Kuray 3 kes girtin. Selim Çiftçi di Girtîgeha Girtî ya Tîpa Lyê ya Ûmraniyeyê de, Yakup Akman jî di Girtîgeha Tîpa Fyê ya Sîlvîriyê de dimînin. Her wiha nûçegihana JINNEWSê Gulistan Dursun, Rojnameger Hayri Tunç û Zeynep Kuray jî ji aliyê polîsan ve hatin derbkirin. Polîsan kesên ku binçavkirin birin Qereqola Çaglayanê, di 29ê Cotmehê de piştî nîvro jî serbest berdana.

## **29ê Cotmehê, 2022**

### **9 xebatkarên Ajansa Mezopotamyayê û JINNEWSê hatin girtin**

Di çarçoveya lêpîrsîna Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê de nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) û JINNEWSê di 25ê Cotmeha 2022an de di serdegirtina mala wan de hatibûn binçavkirin. Her wiha polîsan girtibûn ser buroya ajansê ya Enqereyê.

Navê kesên hatin binçavkirin wiha ne: Gerînendeya Weşana Giştî ya Ajansa Mezopotamyayê (MA) Dîren Yurtsever, nûçegihanên MAYê Deniz Nazlım, Selman Guzelyuz, Zemo Aggoz, Berivan Altan, Hakan Yalçın, Emrullah Acar û Ceylan Şahinli, nûçegihanên JINNEWSê Habibe Eren û Ozgur Deger. Li Manîsayê jî di serdegirtina malan de Mehmet Gunhan ê ku berê li MAYê staj dikir hat binçavkirin.

5emîn Dadgeha Cezayên Sulhê ya Enqereyê ji bo 24 saetan hevdîtina rojnamegeran a bi parêzerên wan re qedexa kir.

Di daxuyaniya Midûriyeta Ewlekariyê ya Enqereyê de hat ragihandin ku ji 14 kesên ku der barê wan de biryara binçavkirinê hebû, 11 kes hatin binçavkirin.

Derbarê Zemo Aggoz de di 26ê Cotmehê de bi şerta sepandina hepsa malê û tedbîrên kontrola edlî biryara berdanê hat dan. Dadger her wiha biryar da ku heta lêpîrsîn bi dawî bibe divê hepsa malê bidome û kelepçeyên elektronîk li Aggoz bê danîn.

10 rojnamegerên mayî jî piştî karên wan ên li midûriyeta polîsan bi dawî bûn îro derketin pêşberî dadgehê. Dadgehê bi şerta qedexeya derketina derve û kontrola edlî der barê Mehmet Gunhan de biryara berdanê û derbarê 9 rojnamegerên mayî jî biryara girtinê da.

### **30ê Cotmehê, 2022**

#### **Di meha Îlonê de, di daxuyaniyên çapemeniyê de 278 kes hatin binçavkirin**

Parlamentêrê CHPê Sezgîn Tanrikulu Rapora Bînpêkirina Mafên Mirovan a Îlona 2022an eşkere kir. Li gorî raporê di meha Îlonê de mudaxele li 27 çalakîyan hatiye kirin. 20 çalakî hatine qedexekirin. Di daxuyaniyên çapemeniyê û xwepêşandanê de 278 kes hatine binçavkirin. Der barê 86 kesên ku mafê xwe yê civîn û xwepêşandanê bi kar anîne de doz hatine vekirin. 37 kesên ku azadiya raman û îfadeyê bikar anîne hatine binçavkirin û kesek jî hatiye girtin. Gihaştina 159 nûçeyên internetê hatiye astengkirin. RTUKê 5 ceza dane kanalan. 2 rojnameger hatine girtin, 3 rojnameger hatine binçavkirin. 6 rojnameger hatine darizandin. 11 rojnameger rastî êrîşê hatine.

### **31ê Cotmehê, 2022**

#### **Çalakiya rêxistinên ciwanên sosyalîst hatin asteng kirin, herî kê 20 ciwan hatin binçavkirin**

Rêxistinên ciwanên Sosyalîst ên ku dixwazin îdiayên bikaranîna çekên kîmyewî, girtina Şebnem Korur Fincancı, mirina karkerên madenê yê Amasrayê û qanûna sansurê protesto bikin, li Îzmir Alsancakê hatin cem hev. Ciwanan li ber Navenda Çandê ya Turkan Saylanê pêşangeha wêneyan vekirin, dema ku xwestin meşekê li dar bixin, Polîsan êrîşî wan kirin. Herî kê 20 ciwan hatin binçavkirin.